



Australian Government

Department of Health

Piştgirîya derheqê xembarî û xemgînîyê de bo kesên COVID 19 li beşê miqayitiya li ixtiyaran bandor gîhandiye wan

Hukûmeta australî alîkariya aborî pêşkêşe xizmetan dikêye bo alîkirina kesên li beşê miqayitiya li ixtiyaran rastî xembarîyê, wendakirinê û xemgînîyê dihên. Van xizmetan bo daniştvanên şûnên miqayitiya li ixtiyaran, kesên miqayitiya li malê bi dest dixin, hezkirîyên wan û karmendên miqayitiya li ixtiyaran in. Dikarî van xizmetan bi xwe bi kar wîni, yan hezkirîyên xwe û endamên civatê derhqê wan de agahdar bikî.

Xizmet belaş in û bo her kesî ne.

Van dezgeh û rêxistinên hemî ji çanda kesian, ola wan, nasnameya wan û şeweya jiyana wan re rêzgir in. Ger hewceya te yan hezkirîyên te bi wergêr hebe, telefona xizmeta wergera nivîskî û dengî bike: **131 450**. Li zimanê xwe û xizmeta tu dixwazî bipirse.

Piştgirî bo xembarîyê û wendakirinê

Şewirmendiya bi telefonê:

Navenda Australî bo Xemgînîyê û Şingirîyê alîkarîyê dide karmendên şûnên miqayitiya li ixtiyaran, alîyên miqayitiya li ixtiyaran dikin, komên olî û civatî, da ku ew jî piştgirîyê li kesên di nav civata xwe de bikin, yê ku bi encama COVID-19 rastî xemgînîyê û xemxwarîyê hatine. Telefona **1800 222 200** bike, bo bizanibî ka çawa dikarî alîkariya civata xwe bikî.

Dema telefon dikî, dikarî wan agahdar bikî ka çi bo alîkirina te û hezkirîyên te divêt. Ev dikare şewirmendiyeke komî be yan şewirmendiyeke du-serî be, bi kesekî pispor re bi rêya telefonê yan vîdyo (by phone or via videoconference), yan rû bi rû.

Navenda Australî bo Xemgînîyê û Şingirîyê xwedîya karmendên duzimanî ye. Van karmendan bi Erebi, Çikî, Farsî, Fransî, Îtalî, Japonî, Maltayî, Sînhali, Tamilî, Spanî û Yiddî (zimanekî Cihûyan e) bi yê telefon dikin re diaxafin. Bo zimanên din, berê telefona xizmeta wergerê **131 450** bike û li Navenda Australî bo Xemgînîyê û Şingirîyê (*The Australian Centre for Grief and Bereavement*) bipirse.

Navenda Australî bo Xemgînîyê û Şingirîyê zimanê bi îşaretan (*Auslan*) jî bo kerr û lalan bi kar dihîne.

Alîkariya bo xwedîyên kêşeyên bîrhanînê (*Dementia*):

Navenda bi navê "*Dementia Support Australia*" 365 rojên salê, rojê 24 sa'etan alîkarîyê dide. Ew îşretan û pêşniyazîyan dide kesên miqayitiya li ewên kêşeyên bîrhanînê (*dementia*) bi wan re hene dikin. Li ser vê jimarê telefona navendê bike: **1800 699 799**. Ger te yan hezkirîyên te hewce bi wergêr hebe, telefona jimara xizmeta wergerê **131 450** bike û li Navenda Alîkariya bo xwedîyên kêşeyên bîrhanînê (*Dementia support Australia*) bipirse.

Piştgirî:

Tora Piştgirîya Ixtiyaran (*The Older Persons Advocacy Network*) li seranserê Australya xizmetên piştgirîya ixtiyaran dide. Ger te kêşe bi xizmetên bo ixtiyaran bi dest dixiye re hebin, karmendên vê torê dikarin alîkariya te bikin. Tora Piştgirîya Ixtiyaran şîretên belaş, bi hevbauerî, serbixwe dide, her weha agahdarî û perwerdeya bo ixtiyaran, malbatên wan û nûnerên wan. Li ser vê jimarê telefone wan bike: **1800 700 600**. Ger hewceya te yan hezkirîyên te bi wergêr hebe, telefone xizmeta wergera nivîskî û dengî bike: **131 450** û li Tora Piştgirîya Ixtiyaran (*Older Persons Advocacy Network*) bipirse.

Bêtir agahdarî derheqê COVID-19 de

Grîng e ji aliyê xizmetên fermî ve xwe agahdar bikî. Serî li malpera *health.gov.au* xe, yan telefone xeta neteweyî ya alîkariya bo vîrosa korona bike: **1800 020 080**. Bo alîkariya wergêr telefone **131 450** bike û li xeta neteweyî ya alîkariya bo vîrosa korona bipirse.